P.O.BOX 7066
16407 KISTA
SWEDEN

Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412

# سەردەمی نوێ

ڕۆژنامەیەکی سیاسی - فەرهەنگی کۆمەڵایەتیە

خاوەنی ئیمتیاز
د. جەمشید حەیدەری
سەرنووسەر
کریم حسامی

ساڵی دووهەم | ژمارە ٢٤ | بەفرانبار ژانویە ١٩٨٨ | نرخی ١٠ کرۆنی سویدە

## ئاورێک لە ڕووداوەکانی ساڵی ڕابردوو

ساڵی ١٩٨٧ کۆتایی هاتوو کۆمەڵی مرۆڤایەتی پێی ناوەتە ساڵی ١٩٨٨ . ساڵی ڕابردووش هەر وەک ساڵەکانی بەرایی ، دنیایەکی پڕ لە کێشەو هەراو تەنگ و چەڵەمەی بۆ مرۆڤایەتی بەجێ هێشت و خەڵکێکی زۆری لە ئاوات و هیوا لە نائومێدی دا هێشتەوە .

یەکێک لە گرنگترین ڕووداوەکانی ساڵی ١٩٨٧ لە بواری جیهانیدا ، چاو پێ کەوتنێ مانگی دیسامبری **گۆرباچۆف - ریگان** بوو کە سرنجی تەواوی خەڵکی جیهانی بۆ لای خۆی ڕاکێشا . بۆ یەکەم جار لە مێژوودا ڕێبەرانی یەکێتی سۆڤیەت و ولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا پەیمانێکیان واژۆ کرد کە بە گوێرەی ئەو کرێمە چەکی ئاتۆمی ئەم دوو ولاتە لە ئورووپا کۆ دەکرێنەوەو بە جارێک لە بەین دەبرێن . ئەمە خۆی هەنگاوێکی گەورە بوو بەرەو نەهێشتنی مەترسی کارەساتی ئاتۆمی و کەم کردنەوەی چەکی ستراتێژی و ڕزگارکردنی جیهان لە مەترسی شەڕی ئاتۆمی و نابوودی یەکجاری .

بۆ ل ٢

## ئیرادەی گەل تێک ناشکێ



ئازادیخوازان لە بەر دەستی داگیرکەران !

ڕاپەڕینی هێمنانەی ئەم دوایی - یانەی خەڵکی تێکۆشەری فەلەستین ، سەرنجی کۆڕ و کۆمەڵە سیاسیەکان و بیروڕای گشتی جیهانی بۆ لای خۆی ڕاکێشاوە . خەڵکی داگیرکراوی فەلە - ستین کە ٤٠ ساڵە ، کەوتوونە ژێر - دەستی حکوومەتی ئیسرائیل و بوون بە قوربانی کەین و بەینی حکوومەتە کۆنەپەرستەکانی عەرەبی ، لەباریکەی غەزە و لە ناوچە داگیرکراوەکانی تری فەلەستین ، ڕاپەڕینێکی هێمنانەی گشتی یان دەست پێکرد و ئەم ڕاپەڕین و مانگرتن و دوکان و بازار داخستنە بەشی داگیرکراوی شاری بەیتولموقەدەس و هەموو ناوچەکانی داگیر کراوی گرتەوە .

داگیر کەرانی جوولەکە لە سەرەتاوە ویستیان بە گوللە و بە کوشتار ئیرادەی خەڵک تێک بشکێنن و ڕاپەڕینی بەر بڵاوی خەڵک سەرکوت بکەن . سەرەڕای کوشتنی دەیان کەس و بریندار کردنی سەدان کەس ، بزووتنەوەی گەلی فەلەستین بەردەوام بوو ، لاوانی کیژ و کوڕی فەلەستین ، قوتابی و خوێندکار و کاسبکار و ژن و پیاو ، ڕژانە سەر شەقامەکان و لە گوللە و گازی ئەسرین ڕێژ و بە لاماری دڕندانەی سەربازانی ئیسرائیل نەپرینگانەوە و لە شەقامەکان دەستیان کرد بە ئاگر تێ بەردانی تایەی ئوتومبیلان و بە خرکە بەرد و مستی پۆلایین بەر بەرەکانیان درێژە پێدا .

بۆ لاپەڕی ٦

## سەفەرێکی سەرکەوتوانە

دەی مانگی ڕابردوو سەفەری **میخائیل گۆرباچۆف** بۆ ئەمریکا دوایی هاتوو پەیمانی کۆ کردنەوەو لە بەین بردنی ڕاکێتی نێو برو کورت بری ئاتۆمی لە ئورووپا ، لە لایەن دوو ڕێبەری سۆڤیەت و ئەمریکاوە واژۆ کرا . سەفەری سکرتێری گشتی حیزبی کومونیستی یەکێتی سۆڤیەت بۆ ئەمریکا بوو بە جێگای باس و سرنجی تەواوی کۆڕو کۆمەڵە سیاسیەکانی جیهان . سرنج دەرە سیاسیەکان ئەمرای ئەو پەیمانە بە ڕووداوێکی گرنگی مێژوویی دەزانن و هەنگاوێکە بۆ لای کەم کردنەوەی لانی کەمی ٥٠٪ چەکی ستراتێژی ئاتۆمی و کەم کردنەوەی مەتر- سی شەڕێکی ئاتۆمی لە جیهاندا .

لە بەیان نامەی هاوبەشی **گۆرباچۆف - ریگان** - دا گوتراوە : ... بۆ بەستنی پەیمانی کەم کردنەوەی ٥٠٪ چەکی ستراتێژی هەنگاوی گرنگ هاوێژراوە . هەر تک ٦ بە نوێنەرانی خۆیان لە ژنێو ئەسپاردوە کە لەم بارەوە سەنەدو بەڵگەی پێویست ئامادە بکەن بەڵکو بتوانن لە چاو پێ کەوتنێ داهاتوی ڕێبەرانی ئەم دوو ولاتە لە موسکۆ - ١٩٨٨ واژۆ بکرێن هەر تک ڕێبەر بە درێژی و بە ڕاشکاوی

بۆ ل ٧

## لە پێناوی یەکێتی نووسەرانی کوردستان لە دەرەوەی وڵات

نووسینی : د . جەمشید حەیدەری

باری ئاڵۆزی کوردستان و ڕەوەشتی دوژمنانەی دەوڵەتە داگیرکەرەکانی کورد - ستان و سیاسەتی چەوسانەوەو زنۆسید بەرامبەر بە کورد گەیشتوتە پلەیەکی هەرە دژوار . ڕۆژ نیە کە چەندها لاوی کورد لە سێدارە نەدرێن و دوژمن دەست ڕێژیان لێ نەکا . ڕۆژ نیە فرۆکەو توپ و چەکی کیمیاوی شارو چەکەو گوندی کوردستان کاول و وێران نەکا و ژن و منال و تەنانەت تازە - لێش قڕ نەکا . کوردستان بۆتە مەیدانی شەڕی ئێران و عێراق و سەربازگای بەعس و پاسدارانی ئیسلام و ژاندارمەی تورک .

زمانی زگماک لە منالی کورد قەدەغە کراوە مێژوی کورد دەشێوێندرێ . خەڵکی کورد ڕادەگوێزرێ لە خاکی باب و باپیریان بەرەو ڕۆژ ئاوای تورکیا یا خود بۆ خوارووی عێراق و بیابانی سەر سنووری سعودیەی ئوردون .

لە کاتێکا ڕێژیمی ئێران و دەزگاو ڕادیۆ- کانی باس ( بیرا ) کوردەکانی عیراق دەکەن ، کوردستانی ئێرانیان کردوتە بنکەی شەڕو مۆڵگەی پاسداران ، مافی نەتەوەیی و مرۆڤایەتی کورد خراوەتە ژێر پێستاڵی ئەرتەشی خومەینی . کوردستانی

بۆ ل ٥

لەم ژمارەیەدا ...

- خومەینی لە سێبەری خۆی دەترسی
- پێشڕەوی گەل
- ڕاسپاردەی لیماو کونگرەی سوسەنتر
- شاعیری کۆمونی پاریس شاعیری شۆڕشگێڕ
- کوردستان لە چاپەمەنیەکاندا
- چریکەیەک
- چاپکراوی نوێ
- بەیاننامەی " ئاکا "

هەواڵنامەی کتێب

# خومەینی لە سێبەری خۆی دەترسێ

زۆربەی چاودێرە سیاسیەکان و دەزگادەو لەتیەکانی ئورووپی و ناوچە، لەو بڕوایەدان کەهەر گۆڕانێك لە ئێراندا ڕوو بدا، پێوەندی هەیە بە ئایەتوڵا خومەینیەوە.

لە ئێراندا ئاکە خاوەن بڕیار هەر ئەوە بێگومان هەر لایەنێك لە دوو ئۆردوگای جیهان، بە چاوبلکەی خۆی دەڕوانێتە وەزعی ئێران و لە بەرژەوەندی خۆیەوە بۆ ڕوودانی گۆڕانێك لە ئێران کار دەکا.

هەندێ لا لە سەر خۆ وبە پشوێکی فراوانەوە بۆ گۆڕانێکی بنەڕەتی لە ئێران کاردەکەن کە ئێران نەك تەنیا ڕزگار بێ لە جەنگە ئەو ڕێژیمە دوا کەوتووە، بەڵکوو دەنگاو بنێ بۆ پێشەوە چوون وچارە سەر کردنی گیرو گرفتیەکانی نێو خۆ و کۆتا بێ پێ هێنانی شەڕی ئێران وعێراق و بەرەو دیموکراتی چوونی ژیانی سیاسی. لایەنەکەی دیکە، دەیەوێ تەنیا لە کەسایەتی و ملهوڕی خومەینی ڕزگاربێ، بەڵام هەموو دەزگاو دارو دەستەکەی بپارێزێ و دووبارە ئێران بگەڕێتەوە بۆ بارو دۆخی سەردەمی ڕێژیمی پاشایەتی.. چونکە ئەو جۆرە ڕێژیمە پتر لە شا خزمەت بە بەرژەوەندی ستراتیژی ئەوان دەکا.

**باری تەندروستی و ژیان وپاراستنی خومەینی چۆن بەڕێوە دەچێ؟**

بەگوێرەی ڕاگەیاندنی دەزگاکانی ڕۆژئاوا، کە گرنگی دەدەن بە ڕووداوەکانی ئێران و چۆنیەتی باری ژیان و تەندروستی خومەینی، وادەردەکەوێ کە تەندروستی ئیمام بەرەو خراپی دەڕوا. تووشی نەخۆشی خەڵك نەناسینەوە و لەبیر کردن هاتوە. گەیوەتە رادەیەك کەنا وانەی دەور وپشتی خۆشی ناناسێتەوە. یاخود ناویان لەبیر دەکا. لەکاتی قسەکردندا زۆر شت تێکەڵ دەکا کە پێوەندیان بە یەکەوە نیە. سیاسەت تێکەڵی باری شەڕدەکاو فیقهی دینی

لە گەڵ زانستی کۆمەلایەتی. زۆرتر باسی ژیانی منداڵی خۆیەدەکا.. قسەکانی پچڕ پچڕن، بەپێی ڕاپۆرتی ئەو دوکتورانەی کە سەرپەرشتی تەندروستی ئیمام دەکەن، هەردەم لەوانەیە کە ئیمام تووشی قەبرانی وەستانی دڵ بێت و چار نەکرێت.

ئیرزەیی لەش ساغی و نەخۆشیەکانی هەمە جۆرەن. ئەوانەی لە ئیمام نزیکن، ئاشکرایان کردوە کە ئەو نەخۆشیانەی- دایمین: پرۆستات، وشك بوون ووەرگەڕانی شادەماری دڵ، کە دووجار تووشی وەستان یاخود شلەژانی دڵ هاتوە. جارێك لە یەنوەری ١٩٨٠، جاری دووەمیان لە یونی ١٩٨٥. چاوەکانی خەراپ دەبینن. چاوێکی کوێر بوە و هەر نابینێ. لەشی لەر ولاوازە وتوانای ڕۆیشتنی نیە. لە شەش دەقیقە پتر ناتوانێ بدوێ، ئەویش زۆر لە سەرەخۆ. زۆر هەوڵ دەدرێ ژیانی بپارێزرێ. چونکە بەردەوام بوونی شەڕی ئێران وعێراق بەندە بە مانی خومەینیەوە وەك ئاشکرایە سێ لیژنەی دوکتوری سەرپەرشتی تەندروستی خومەینی دەکەن:

١ لیژنەی دوکتورە ئێرانیەکان بە سەرۆکایەتی کۆنە وەزیری تەندروستی دوکتور عەلی ڕەزامیرعارفی کە لەو دوایینەدا بە ناچاری لە جەماران دەزی بۆتەوە لە نزیکەوە ئاگاداری وەزعی ئیمام بێ. دوکتور مەلیکی پسپۆڕی نەخۆشی دڵ و- پروفیسۆر شەمس پسپۆڕی نەخۆشی چاو، و دوکتور سەمیعی پسپۆڕی نەخۆشی دەمارەکانی دڵ، جگە لە دوکتور سەرهەندی وەزیری تەندروستی، ئەوانە بە تێکڕایی سەر پەرشتی تەندروستی خومەینی دەکەن.

٢ لیژنەی دوکتورەکانی ئینگلیز بە سەرپەرشتی پسپۆڕی دڵ دوکتور فیلیپ دیمیرال کە هەموو مانگە جارێك سەر لە تاران دەدا و سێ دوکتور یارمەتی دەدەن.

بۆ ل ٧



پاشماوەی ل ٢

# ئاوڕێک لە ڕووداوەکانی ساڵی ڕابردوو

بەلام دیسان پێشمەرگە نەبەزەکانی کورد توانییان چارو بار دەست لە دوژمن بوەشێنن و حاکمیەتی ئانیسلامی ڕێژیمی ئاخوندی لە کوردستان وە لەرزە بخەن.

کوردستانی تورکیاش لە ساڵی ڕابوردوودا لە پەلامارو هێرشی لەشکری تورك بە دوور نەبوو. گرتن و ئازارو شکەنجەی ئازادیخوازانی کوردو گواستنەوەی بە زۆرە ملێ خەڵك و چۆڵ کردنی گوندەکانی کوردستان لە لایەن لەشکری داگیرکەری تورکەوە، هەر بەردەوام بوو. بەلام گەلەکەمان لەو بەشەی کوردستانیش بە پەلاماری چەکدارانەو بە خەباتی کۆڵ نەدەرانە بە دوژمنی نیشان دا کە ئەشکەنجەو بەندو ئیعدام ناتوانێ ئیرادەی شۆرشگێڕان تێك بشکێنێ.

لە فەلەستینی داگیرکراو خەباتی ئازایانەی خەڵکی فەلەستین لە ڕۆژەکانی ئاخری ساڵی ڕابوردوودا ئیسرائیلی داگیرکەری شلەژاندو کۆڕی نەتەوە یەك گرتوەکان و زۆربەی وڵاتانی جیهان پشتیوانی خۆیان لە خەباتی ڕەوای خەڵکی فەلەستین ڕاگەیاندو کردەوەی دڕندانەی حکومەتی ئیسرائیلیان مەحکوم کرد.

دیاردەی لە باری بەرچاو لە خەباتی خەڵکی فەلەستین لە ساڵی ڕابوردوودا، یەکگرتنەوە و ڕێك کەوتنی هەموو هێزەکانی جولانەوەی ڕزگاریخوازی فەلەستین بوو کە بێ گومان لە خەباتی داهاتوودا نەخشی بەرچاوی دەبێ. لە ئەفغانستان سەرەڕای سیاسەتی ئاشتی خوازانەی حکومەتی دیموکراتیکی ئەفغانستان و ڕاگەیاندنی ئاشت بوونەوەو لێی خۆش بوون و کۆتایی پێ هێنانی شەڕ، دیسان ئاقمی ڕاکردووی دەربەدەگ و چەوسێنەرو سەر بە ئیمپریالیزم، بە هاندان و یارمەتی ڕاستەوخۆی ئیمپریالیزمی ئەمریکاو حکومەتە کۆنەپەرەستەکانی ئێران و پاکستان و عەرەبستانی سعودی شەڕو ئاژاوەیان درێژە پێ داو نەیان هێشت ئاشتی و ئاسایش بۆ وڵات بگەڕێتەوە.

لە ئەمریکای لاتین سەرە ڕای گێرە شێوێنی حکومەتی وڵاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکا، سەرکۆماری پێنج وڵاتی ئەمریکای ناوەندی لە کۆبونەوەیەك دا پەیمانی ئاشتی و بڕانەوەی شەڕیان ئیمزا کردو وتووێژی نەهێشتنی شەڕ لە نیکاراگواو ئەلسالوادۆر دەست پێ کرا.

ڕسوایی (ئیران گیت)، فرۆشتنی چەکی ئەمریکاو ئیسرائیل بە ئێران، لە ساڵی ڕابوردوودا گەرمترین بازاری چاپەمەنیەکانی ڕۆژئاواو شلوغ ترین سیاسەتی نێو کۆشکی سپی بوو. نەك هەر ئەوە بۆ خەڵك ڕوون بووە کە وڵاتەکانی سوید و ئوتریش و ئەسپانیاو ئەلمانی ڕۆژئاواو فەرانسەش چەکیان بە ئێران فرۆشتوە. حکومەتی ئیسلامی ئێرانیش سیاسەتی "نە شەرقی و نە غەربی" خۆی لەو بارەوە بە جوانی پیادە کردوە.

با بزانین ساڵی ١٩٨٨ بۆ گەلانی ژێر دەست و چەوساوە چ بە دیاری دێنێ و ئێمە دەتوانین چ خزمەتێك بە خەبات و فەرهەنگی گەلەکەمان بکەین؟ هیوادارین ساڵی ١٩٨٨ بۆ گەلانی جیهان ساڵی ئاشتی و بۆ نەتەوەی کوردیش ساڵی ئازادی و سەرکەوتن بێ. ★

**"تێبینی"**

گێڕانەوەی نووسراوەو بۆچوونی چاپەمەنی جۆربەجۆری جیهان لە بارەی کوردستان و ڕووداوەکانی نێو جوولانەوەی ڕزگاریخوازی کورد، بەو مانایە نیە کە نێوەرۆکی باسکراوەکان بە تەواوی لەگەڵ بۆچوون و بیرو باوەڕی دەستەی نووسەران یەك دەگرنەوە. مەبەستی ئێمە ئەوەیە کە خوێنەرانی بەڕێز لە بۆچوون و بیرو ڕای ڕێکخراوەو حیزب و کەسانی جۆربەجۆر لە بارەی کوردستان و بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد ئاگاداری یان هەبێ.

"سەردەمی نوێ"

# چاپکراوی نوێ

КУРДСКОЕ ДВИЖЕНИЕ в новое и новейшее время

: بزووتنەوەی کورد، سەردەم و کاتی ئێستا "

ئەم لێکۆڵینەوە زانستییە بابەتییە تەرخان کراوە بۆ مێژووی بزووتنەوەی کورد و ڕاپەرینەکانی لە نێوەڕاستی سەدەی ١٩ تا نێوەڕاستی هەشتاکانی سەدەی بیستەم.

ئەو کتێبە لە لایەن ئاکادیمی زانستی سۆڤیێت - ئەنستیتوی ڕۆژهەڵاتناسی - لە موسکو ولە ئەرمەنستان ئامادە کراوە.

پێنج زانای کوردناسی بە ناوبانگی یەکێتی سۆڤیێتی لە نووسینی ئەو کتێبەدا بەشدار بوون. دەستەی نووسەرانی ئەو کتێبە لە سێ کەس لەدوکتور حەسرەتیان مانوئێل، دوکتور میخائیل لازەریف، و دوکتور شاکرۆی محوّ" پێك هاتوە کە دوکتور حەسرەتیان بەر پرسیارە.

ئەم کتێبە لە قەوارەی ٢٠٩ لاپەڕەدایە و لە لایەن دەزگای بڵاوکردنەوەی(ناووکا) ساڵی ١٩٨٧ لە موسکو چاپکراوە.

لە پێشەکی دەستەی نووسەراندا گوترا وە : کورد یەکێکە لە دێرینترین میللەتانی ڕۆژهەڵاتی نیزیك و نێوەڕاست. شوێنەوارێکی دیاری لە مێژووی ناوچەدا بەجێ هێشتوە. بەشداری کردوە لە هەموو ڕووداوە گرنگەکانی ڕابردوودا. خاوەنی کولتوری تایبەتی خۆیەتی. کوردەکان دەور یکی بالایان بینیوە لە بەرەو پێش چوونی باری ڕوحی میللەتانی تورکیاو ئێران و- وڵاتانی عەرەبی دا."

نووسەرانی ئەم لێکۆڵینەوە زانستییە ئەو ئەرکەیان خستۆتە سەر شانی خۆیان کە لە هەموو لایەنێکی ئەو ڕەوەندە مێژوو بیە بکۆڵنەوە. هەروەها لە پێشەکییەکەدا، نووسەرانی بەشە جیاوازەکانی کتێبە کە دیاری کراون.

کتێبە کە بریتی یە لە دووبەش..

بەشی یەکەم لە سێ فەصل پێك هاتوە :

فەصلی یەکەم - لاپەڕەی ٥ - ٣٠ دوکتور جەلیلی جەلیل.

فەصلی دووەم و سێیەم: لاپەڕی ٣١-٨٤ نووسینی دوکتور لازەریف.

بەشی دووەم لە پێنج فەصل پێك هاتوە لاپەڕەی ٨٥ - ٢٦٦

لە بەشی دووەمدا ئەو لێکۆڵینەوەی کە پێوەندی بە کوردستانی تورکیاوە هەیە لە لایەن دوکتور حەسرەتیانەوە نووسراوە. ئەوەی پێوەندی بە کوردستانی عیراقەوە هەیە، دوکتور شاکرۆی محوّ نووسیویەتی. ئەوەی پێوەندی بە کوردستانی ئێرانەوە هەیە، لە لایەن دوکتور وێگالیەنە وە نووسراوە.

هەروەها ئێندێکسی ناوە جوگرافیاکانی ئێو لێکۆڵینەوەکە لە لایەن ئا.بەگەروف ئاما دەکراوە. بیبلیوگرافیای کارەکە لە لایەن لەیلی ئەجایەفەی ڕێکخراوە وئامادە کراوە.

بێگومان ئەو لێکۆڵینەوەیە گرنگی تایبەتی هەیە لە مێژووی کوردناسی سۆڤیەتی دا، سەبارەت بە خەباتی ڕەوای گەلی کورد لە پێناو مافی نەتەوایەتی و ئازادی‌دا وەرگێڕانی ئەو کتێبە بۆ سەر زمانی کوردی ئەرکێکی پیرۆزە و شوێنێکی تایبەتی لە کتێبخانەی کوردی دا پڕدەکاتەوە.

پاشماوەی ل ٣

## ڕاسپاردەی لیما و کۆنگرەی "سوسەنتر"

"ئێمە لە بنەماوە جولانەوەیەکی پلورا لیستین کە لەگەل هیچ تەعبیر و لێکدانەوەیەکی فەلسەفی لە بارەی سوسیالیزمەوە یەك ناگرینەوە" ئەوە ڕاستە. بۆچوون و ڕێبازی سوسیالیزمی دیموکراتیك و ئینترناسیونالی سوسیالیستی لە گەل تەعبیر و لێکدانەوەی فەلسەفەی سوسیالیزمی زانستی یەك ناگرێتەوە. چونکە لە بۆچوون و سیاسەتی ئەواندا نە سەلەی خەباتی دژی ئیمپریالیستی و خەبات بۆ گۆڕینی پێوەندییەکانی سەرمایەداری و نە هێشتنی چەوسانەوە هەر باسی نیە.

لە بارەی" دیفاع لە مافی گەلانی ژێر ستەم" لە "ڕاسپاردەی لیما "دا کە سکرتێری حیزبی دیموکرات باسی دەکا هەر ئەوەندە گوتراوە : " ئاشکرایەکە ئێمە لە سەرانسەری جیهان دا لەگەل ئەو گەلانەی کە بۆ ئازادی خۆیان خەبات دە کەن، هەلوێستێکی هاو پێوەندی دەگرینە پێش. بەلام لەم پێوەندییەدا دەلیلێکی دیکەش هەیە: لە بەر ئەوە کە قەوارەی دەسەلات بە چەشنی زیدە بۆتە نێو نەتەوەیی، هیچ جولانەوەیەکی میللی بە لاگری سوسیالیستی ناتوانێ سەر کەوێ" ئاوا بە دیفاعی ئینترناسیونالی سوسیالیست لە مافی گەلانی بن دەست وبەشخوراو. هە ر بۆیەش وەك دوکتور قاسملو دەلی : "لە بارەی مەسەلەی ڕۆژ هەلاتی نێوەڕاست لە کونگرەدا قسە نەکرا" ڕەنگە لە بەر ئەوە بووبێ کە بە لای ئەوانەوە لە ڕۆژ هەلاتی نێوە ڕاست دا نە میللەتی بن دەست و بە شخوراو هە یە و نە شەر وکێشەی ماڵ وێرانکەرانە !

# بەیاننامەی ئاکسا

کۆمەلەی خوێندکارانی کوردستان لە دەرەوەی ولات ( ئاکسا ) لقی مەجارستان بەیاننامەی کۆتایی کۆبوونەوەی سالانەی خۆیان بۆ ناردووین.

لە بەیاننامەکە دا گوتراوە : لە ریکەوتی ١٤/١١/١٩٨٧ ( ئاکسا)لقی مەجارستان بە بەشداری نوێنەرانی ڕێکخراوی یەکێتی نیشتمانی کوردستان، پارتی سوشیالیستی کوردستانی عیراق، پارتی دیموکراتی کوردستانی عیراق و کۆمەلەی خوێندکارانی کورد لە ئوروپا کۆبوونەوەی سالانەی خۆی پێك هینا.

لە بەیاننامەکەدا پاش باسی وتاردانی میوانەکان و ڕاپورتی کۆمەلە گوتراوە :

" لە ڕاپورتی کۆمەلە دا بە شێوەیەکی زانستانە شوناسنامەی ڕژێمە داگیرکەرەکانی کوردستانی تێدا کرابوو کە بە هەموو هێزو توانایەکیانەوە هەوڵی لەناو بردنی گەلی کورد ئەدەن. ئامادە بوان پشتگیری خۆیان دەربری بۆ هێزە سیاسیەکانی سەرگۆڕەپانی خەبات، هەروەها دەنگی نارەزایی خۆیان بلند کرد دژی ڕژێمە کۆنە پەرست و دیکتاتور و فاشیەداگیر کەرەکانی کوردستان کە ڕامیاری تواندنەوەی نەتەوەی کوردیان گرتۆتە بەرو هەولی گۆڕینی ڕووی ڕاستی و مێژوویی گەلی کورد ئەدەن و جەنگێکی نارەوا و کۆنە پەرستانەیان دژ بە گەلی کورد هەلگیرساندوە کە بریتی یە لە کوشتن و زیندان و هەلواسین وسوتاندن و کۆچ پێ کردنی هەزارها گوندی کوردستان، تا دڕندایەتیان گەیشتۆتە ئەو ڕادەیەی کە چەکی کیمیایی بە کار بهێنن دژ بە دانیشتوانی ناوچە ڕزگارکراوەکان کە بە کار هێنانی لە سەر ئاستی جیهانی قەدەغەیە ".

بەشداربوەکان دلخۆشی و پشتگیری تەواوی خۆیان نیشان دا دەربارەی نزیك بوونەوە و هاوکاری هێزەنیشتمانیەکانی کوردستانی باشوور، کە هەنگاوی یەکەم بێت بۆ دامەزراندنی بەرەی کوردستانی و ڕێکخستنی ڕیزەکانی بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی گەلی کورد.»

لە بەیاننامەکەدا جم و جوڵی هێزە ئیمپریالیستەکان بەسەرۆکایەتی ئەمریکا و کۆکردنەوەی دەیان پاپوڕو فروکەی جەنگی لەناوچەدا لەگەل سیاسەتی ئەمریکالە " تەشەنە کردنی چەکی ئاتومی و هەولدان بۆ بەکار هێنانی ئاسو( الفضاء) بۆ ئەو مەبەستە " بە توندی مەحکوم کراوە.

بەشی سەرەکی ڕاپورتی سیاسی و کاتی کوبوونەوە، بۆ لێکولینەوەی تێکوشان و بە تەنگەو چەلەمەی یەکیتی خوێندکاران تەرخان کراوە و لە بەیاننامەکە دا گوتراوە: " .. پێویستە بە گیانێکی دلسوزی و لە خۆ بووردنەوە دەست بخرێتە ناو دەست و خۆ دوور بخرێتەوە لە هەندێ هۆی نابەجێ کە بوتە کۆسپ لە ڕێگەی بزوتنەوەی خوێندکاراندا .. "

بەیاننامە کە بە دروشمی :

– بژی یەکگرتنەوەی ڕیزەکانی بزووتنەوەی خوێندکارانی کوردستان لە دەرەوەی ولات.

– سەرکەوتو بێت خەباتی ڕەوای گەلی کوردمان لە کوردستانی گەورەدا بۆ بەدی هێنانی مافی چارەنووسی.

– بژی ئاشتی لە جیهاندا. »

ئیمە سەرکەوتنی لاوان و خوێندکارانی کورد لە پێناوی یەکیتی و یەکگرتنەوەی ڕیزەکانیان و درێژەپێدانی خەباتی ڕەواو یەکگرتوویان بە ئاوات دەخوازین.

# گۆشەی ئەدەب

شاعیری بەرێز و ناسراوی کورد مامۆستا " دڵـزار "

- لە سەر هەندێ لایەنی دەستووری - زمان نامەیەکی بۆ ناردووین ، لەگەڵ سوپاس ئەوا دەقی نووسراوەکە بڵاو دەکەینەوە.

«با لە سنووری دەستووری زمانەکەمان دەرنەچین»

لە کوردیدا ئامرازی کۆکردنەوەی ناوان بە زۆری ( ئان )، ( ئەکان ) ە وەك ئەم نموونانەی خوارەوە •

| ناو | نەناسراو | ناسراو |
|---|---|---|
| کورد | کوردان | کوردەکان |
| پیاو | پیاوان | پیاوەکان |
| سەر | سەران | سەرەکان |
| دڵ | دڵان | دڵەکان |

... هتد ... ئەمەجگە لە ئامرازی ( گەل ) ، ( یەن ) ، ( ها ) وەك گاگەل• گابەل• هەزارەها ، جارها ••هتد••

بەڵام ئەو ناوانەی کە بە ( ئا ) کۆتاییان دێ وەکو :

١- چا ، چیا ، گیا ، با ، تا ، کا ، گا ، کەلا ، گەلا هتد••

٢- ئەو ناوانەی کە بە واوی کراوە ( ۆ ) کۆتاییان دێ وەکو : پشکۆ ، ئاسۆ ، هەلۆ ، نۆ •• هتد •••

٣- ئەو ناوانەی کە بە یێی کراوە ( ێ ) کۆتاییان دێ وەکو : خوێ ، نوێ ، رێ ، جێ ، سێ ••هتد••

٤- ئەو ناوانەی کە بە یێی درێژ نووقاو کۆتاییان دێ وەکو : ماسی ، سینی ، کورسی ، برسی •• ئەمانە هەموویان ئەگەر نەناسراوبن بە (یان) و ئەگەر ناسراویش بن بە ( یەکان ) کۆ دەکرێنەوە وەك :

١- با ، بایان بەڵام ( باکان ) کۆکراوەی ( باك ) ە • لەگەڵ بێ باکان مەگەرێ •

- چا ، چایان ، چایەکان ، بەڵام(چاکان) کۆکراوەی ( چاك )ە ،هاوڕێ ی لاوچاکان بە •

- تا ، تایان ، تایەکان بەڵام (تاکان) کۆکراوەی ( تاك )ە •

- کا ، کایان ، کایەکان بەڵام (کاکان ) کۆکراوەی ( کاك )ە •

ئەرێ کاکان ئۆغربان کرد ؟

- کەلا کەلایان ، کەلایەکان بەڵام (کەلاکان ) کۆکراوەی (کەلاك )ە •

٢- پشکۆ ، پشکۆیان ، پشکۆیەکان نەك پشکۆکان •

- نۆ ، نۆیان ، نۆیەکان نەك ( نۆکان ) کە کۆکراوەی ( نۆك )ە •

کاکە خۆ نەهاتووین نۆکان بچێنین !

٣- خوێ ، خوێیان ، خوێیەکان نەك (خوێکان ) •

- نوێ ، نوێیان ، نوێیەکان نەك ( نوێکان ) •

- رێ ، رێیان ، رێیەکان نەك رێکان ، (رێکان) کۆکراوەی ( رێك )ە • لەگەڵ رێکان رێك دەکەوم •

٤- ماسی ، ماسیان ، ماسییەکان

- سینی ، سینیان ، سینییەکان

- برسی ، برسیان ، برسییەکان

جا دەبێ ئەمەش بڵێین کە ئەم جۆرە کۆکردنەوە نوێیە بەرچەپەی رێزمانە : گاکان ، پشکۆکان ، نۆکان ، رێکان•• لەهەموو کوردستانی پان و فراواندا تەنیا لە ناوچەی سلیمانی سەری هەڵداوەو هەندێ خوێندەواری لاویش قوزتوویانەتەوە • بەلای منەوە بەرەو پێشەوە چوونێکی سروشتی زمان نییە• ئەگینا ئەلەو بەشە هەرە گەورەیەی کوردستانەدا پیڕەو دەکرێ ، کە کەوتوتە بن دەستی تورانی بە شۆڤینی بەمیلیتاریستە چەپەڵەکانەوە نە لە کوردستانی ژێر چەپۆکی رێژیمەس ئاخوندەکانی ئێران و نە لە ناوکوردەکانی سوریە و سوڤیت و تەنانەت لە ناو راستە سۆرانی ئەسڵیشدا - مەبەستم لە سۆرانی ئەسلی ئەو ناوچەیەیە کە دەکەوێتە نێوانی زێی بادینان و زێی کۆیەوە وەك ولاتی هەولێرو کۆیەو بیتوێن و خۆشناوەتی و باڵەکایەتی و ناودەشت و شوێنانی دیش - کەس نالێ : ئەرێ حەمەگاکانت ئاودا ؟ کورە حەسۆ پشکۆکانت کوژاندوتەوە ؟••

لە کۆتاییشدا حەز دەکەم خوێندەوارانی بەڕێز و خۆشەویستی کورد رای خۆیان لەسەر ئەم بۆ چوونەی من دەربڕن و بە شێوەیەکی زانستیانە لێی بکۆڵنەوە بە نیازی گەیشتن بە ئەنجامێکی بەکەڵك لە رێی خزمەتکردنی زمانە شیرینە دەوڵەمەندەکەماندا•

# دەردی دڵ

ئاشتی

کێ دەزانێ چ لە نێو ئەم دڵەدا رادەبرێ
چۆن بە ئاورینگی نیگایێکەوە زوو گڕ دەگرێ

کێ دەزانێ کە لە دووریی وەتەن و یارو هەڤاڵ
چۆن شەوی تار و درێژ لە منی رەبەن رادەبرێ

کێ دەزانێ شەوی بێ هەست بە وەرینی خەزەڵێك
چۆن غەمی یاری لە دەست چوو سەرو دڵ دادەگرێ

ئەو کەسەی هەستی بە سامی شەوی تەنیایی نەکرد
کوا دەزانێ شەمی پێك گەینەوە چۆن هەڵدەکرێ

ئەو کەسەی وا نەچەمی پشتی لەتاو بەژنی زراو
کوا دەزانێ کە چلۆن پەرچەمی راست هەڵدەکرێ

ئەو ئەوینەی بە درێژایی زەمان کەوتە دڵان
کوا بە پشتێك و زەمانێك لە دڵان دەردەکرێ

تا وەبیر دێتەوە یار و گەلی ژێر دەستی نەیار
وەکوو پاییزی چەمەن ، کەولی خەفەت رادەخرێ

بەم هەموو ژانەوە ژەهرە ژەمی ژین ، تاکوو دەمێ
سەری ئەو شووشە شەرابەی کە دەڵێم - بادەدرێ

دەردی دڵ کردنی پڕ راز و رەمز کەڵکی چی یە؟
کێ دەزانێ چ لەنێو ئەم دڵەدا رادەبرێ •

* * *

پاشماوەی ل ٢

# پیشرەوی گەل

بمانەوێ و نەمانەوێ راستەو خۆ لەگەڵ رژێمی کۆنە پەرستی حاکم و پشتیوانەکەی ئیمپریالیزمی جیهانی رووبەروین • ئیتر خۆ لە خوارە پێچ گرتن و فەلسەفە تاشین و کوێرە رێ دیتنەوەو رۆیشتن بە رێگای چەوت و دوور لە رێگای راست و درووست و زانست دا ، نەك هەر خزمەت بە گەل و نیشتمان نییە ، بەڵکو بە تاوانیش دەژمێردرێ و خەبات وە دوا دەخات •

جا لێرە دایە کە دەڵێین پێشرەوی گەل رێکخراوێکە لە سەر بناخەی زانست دامەزراوێ و دۆست و دوژمنانی نێو خۆ و دەرەوەی بە روونی لە پروگرام و بۆچوونی خۆیدا دیارو دەست نیشان کردبێ و زۆربەی گەلەکەی بە پشتیوان و یاری دەدەر بزانێ • ئەو کاتەیە دەتوانین بڵێین کە ئاسۆیەکی روون بۆ گەلی کورد هەیەو دەکرێ و هیواو هومێدی پێ ببەستین• دەنا هەر وا وەك ئێستا کە رۆژانە دەیان کەس فیداکارانە بۆ گەل و نیشتمان بۆ ئازادی نەتەوەکەی لە گۆڕەپانی کوردستاندا شەهید دەبێ و دەسەڵاتداری حاکمیش دیکتاتۆرانە بەو پەری بێ بەزەیی کورد قەتل و عام دەکات و وڵات وێران دەکات لە هیچ جێنایەتێك دەست ناگێڕێتەوە دەشێتینەوە •

تۆ بڵێی دوا رۆژی ئەو هەموو گیانبازی و فیداکارییە بە کوێ بگات ؟

" سەعید "

Ji R. 1

## Siyaseta du rûyî ya Iranê

Ew wek êxsîran çavê xwe di din wan penaberên (muhacirên) Efganî û çi mafekî na dine wan. Ew ne çarin ji bona nanê xwe peyde bikin, karên giran dikin. Ji wê jî pitir îran wan di şerê îraqê de bikar tîne.

Hukmeta îranê dixwaze wilo nîşa bide ku ew tagirya şorişgerên Efganistanê dike li di jî komara dimokratika efganistanê, lê ew gotina wî jî pire ji direwan. Ew karbidestên iranî yên ku gelên ne faris di iranê de bidest dikin, dixwazin pirsa efganistanê jî li gor berjewenda xwe biben.

Rijêma islamiya îranî dixwaze siyaseta xwe bi gehne welatên ciran û wan li dû xwe bajot. Ji bo vê mebestê jî xumênî ferman da ku leşkerek 20 milyonî dirist bik ku bi xurtî hukmetek şîe di welatên naverrast û nîzik de dane. Lê heya niha wê xweziya wê ser ne girtiye.

Piştî ku bo hukmeta iranê xweya bû ku ew nikare biçeki deshilata xwe bi ser îraqê de dane, ew dixwaze efganistanê jî bo şandina şorişa îslamî bikar bîne. Hukmeta iranê niha pir ditirse ku bernamê aştbûna giştî ya hukmeta kabol pêsniyar kirî ser biyare û efganistan bibe bingeh ji bo şoreşgerên gelên iranê. Li vir stirtijika hukmetêra îranê wek ya Emrîka ye ku dixwaze hukmeta kabolê bişewite ji bo ew piropagendeya xweya îslamî pê bike. Melayên iranî baş dizanin ku serûberê Islamî li efganistanê çi bi ser nehatiye, lê ew li hember vê çendê çavan digirin. Di Efiganistnê de çi sinnî çi jî şîe, mezheb azadin melayên efganistanê temam alikariya komara kabol dikin, di demekî de ku Kurd li îrnaê baş dizanin kanê reftara şieyan di gel sunniyan çawane!..

Hukmeta iranê ku çi mafên kurdên iranê nedane, dixwaze dilsoziya xwe ji kurdên iraqê re diyar bike.

Ev durûyiye di siyaseta iranê de her wê di vê de ye. ✶

Ji R.1

## Xumênî ji Sîbera xwe ditirse

Gotinên wî ne lêkdayî ne, pir tiştan têkilî hev dike. Pitir ew behsa zarokiya xwe dike. Li gor raporta dixtorên wî sexbêr diken, ne dûre ku ha de tuşî nexweşiya dil bibe ku di çare nabe. Serûberê nexweşiya Xumênî pir core:

Pirotistat, û xavbûna nihiyên xwînê ku ew du caran rûçi dil ji lêdanê rawestandî bûye. Cara yekem di meha jenuerî 1980-an de, carta duwem di meha junî 1985-an de.

Baş nabîne û çavekê wî kore bûye. Leşê wî dilerze, xwe li ser piyan nagire û pitirji şeş deqîqan nikare baxive, ew jî pir hêdî.

Pir hewil didin jiyana wî biparêzi. Wek diyare sê licnên dixtoran çavdêriya wî dikin:-

1- Licna dixtorên Iranî bi rêberiya kevne wezîrê saxlemiyê Dr. Ali Riza Mir Arifi ku li Cemaranê di mine ji bo nêzik be. Dr.Melikî pisporê nexeşiyên dilî, Dr. Semiiy pisporê nexweşiyên demarên xwînê, Dr. Şems pisporê nexweşiyên çavan, ji bilî wezîrê saxlemiyê Dr.Merendiku ewhemi bi tev re çavderiya saxlemiya Xumênî dikin.

2- Licna dixtorên Engiliz bi rêberiya Dr. Filip pisporê dilî ku her mehê carekî diçite Iranê û sê dixtor alikariya wî diken ku her yek pisporê nexweşiyekê ye. Cav, pirostat, pisokilojî.

3- Licna dixtorên Nemsa biserokiya pirofisor Hans Saroki Mamostayê nexweiyên dil, Ew salê 3-4 caran diçe Iranê û hine caran di demê 24 seetande wî bang dikin û bi balefira taybetî dibin. Du alikarên wî li Nemsa dimînin, mîna Dr. Lîtimadî û Dr.Îmanî. Cihê Xumênî

Xeber dibêjin ku li cemeranê li ser mala Xumênî jorek taybetî bi amûrên mudernên dixtorî çêkiriye ji bo çare seriya wî û jorek din jî li Niyaweranê çêkiriye, ku Riza Pehlewî ji diya xwe re çêkiribû. Nihanû tir kirine û aimadeye bo zehmet tirin emelyatên dilî.

Ji bilî wê, cihê Xumênî mîna kelhekî eskeriye, li Cemeranêsê betalyonên eskerî zêrevaniyê li cihê wî dikin, û digel fewcek fidayiyan ku hemî dibin 2000 kes û bi çekên baş û tazebi çek kirine, mîn roketên jehrî 7 yên sovyetî, çekên R.B.C 70 yê Swêdî li dijî firo'kan û çend binkên rokitên (Hok) yên Emrîkayî û sam 2, Sam 6 yên Sovyetî

Cihê Xumênîji çwar xaniyan pêktê:

1- Yekem yê bazirganekî Iranî bû, piştî Şorişê ji Xumênî re kir diyarî 8 jorin û baxekê mezin. Jina Xumênî (Betul Seqefî) bi keça xwe (Emane) re têde di ronin

# Kurdistan di çapemeniyan de

Belavoka "KAR" organa Komiteya navîn ya rêkxirawa "Fîdayi Xelkê Îran"- Ekseriyet- di hejmara xweya 24 de gotarek li bin navê "Rêya Serketina tevgera netewî ya gelê Kurd" belav kir, dibêje:-

28-ê gelavêjê 8 sal biser hêrişa hêzêt Xumênî bo ser xelkê Kurd de derbaz bûn. Berî 8 salan Xumênî ferman da bû ku tevgera Kurdan bê deng bike. Her wiha di wê demê de part û rekxirawên çep û pêşketinxwaz ketin ber hêreşên "Hîzbullah". Ew hev demiye bi xwe nehat, Xumênî agehdarî tevbizavên çîna Karker û gelên bindest bû, ew ji têkeliya wan tevgeran ditirsa, lewra wî fermana serbirîna wan du tevgera di yek dem de da. Vaye heştsal bi ser wê hêrişê û fermanê re bûrîn û tevgera kurdî li Îranê mîna tev yên din bi gelek evrazî û nişîviyan de bûrî. Hîn dersên pir biha bûye. Ew baş dizane ku bêy girêdan û têkeliya wê bi tevgera çîna karker re ya ku rêkxirawên Komunîst birê di ben, sernakeve. Êdê kurd çi bi sêdaredana "Qazi Mehemmmed", çi jî bi bi kuştina "Şerîf Zadey" helwista rijêma şahî tecrube kiriye. Piştî şorîşa iranê jî, dirindî û hovetiya rijêma " Wilayet Feqî" jî biçavên xwe dît. Her wiha hîzra xwe perstî ya qada burjiwa û libirala bazirgan jî dît. dît ku ew bi dijî mafê diyarkirina çarenivîsa gelan û xwe muxtariyê ne. Niha ji xelkê Kurd dibîne ku hêzên burjiwa û librarên oposyona rijêmê gava navê xwe muxtariya Kurdistanê dibihîsin, di bêjin ew xwe cudakirine. Ev tecribe hemî diyar dikin ku bi tinê tevgera komunîzmê ye li Îranê ku ji dil dixwaze tevgera gelên bindest bi parêze. Bi tinê Komunîst bêy qeyd û şert mafê gelan ji bo diyarkirina çarenivîsê bi rats diznaine û berevaniyê jê dikin. Siyaseta şaş ya rêkxirawa me li hember doza Kurdî di salên 82-83-an de nikare vê rastiyê veşêre ku hêza komunîsta alikariya diyar kirina mafên gelan dike nexasme (Biteybetî) gelê kurd. Bi van tecrûbên serî diyar dibê ku gerek tevgera gelê Kurd wê bawere ji serê xwe bavêje ku burjiwaza lîbral daxwaziya (xwe mixtarî) di de. Gereke bi temamî vê tevgerê bêxne ser rêya hevgirtinê bi hêzên komunista karkeran û rêkxirawên pêşketî de. Du dilî di vê rê de ziyanê digehmite tevgera Kurdî. Tevgera Kurdî bêy têkeli bi wan re nikare mafên xwe wergire. Her ji bo wê jî rêkxirawa me ji bo vê nêzîk bûnê xebitiye. Rêkxirawa me çand caran pêşniyar bi parta dimokrata Kurdîstana Îranê re kirine û pêhingav ji havêtne, lê mixabin ku parta dimokrat tiştek nekir. Eve di demekî de ku tevgera kurdî di astengan de di jî û pêwîstî bi hevgirtina hêzên niştimanî yên Kurdistanî bi hêzên komunist û pêşketî yên seramserî iranê heye û pitir ji berdem.

Herwiha tevgera kurdî tûşî fêlên herdu rijêmên paşvero yên îran û îraqê bûye. Rijêma iranê dixwaze hêzên hukmeta Seddam bêxte di xizmeta xwe de, Seddam ji her wê siyasetê bi kardîne. Divî warî de herdu rijêm wicê ji hêzên Opozoyonên hevdu werdigirin. Topbarankirina bink û ciyên hêz û rêkxirawên iranî di Kurdistana Îranê de, ji bo wê ye ku ew wan bastir bêxte di bin desthelata xwe de. Evro hêzên pêşketnxwazên Îranê akinciyên deverên rizgar kiri yên kurdistana îraqê ne û ketine berdirbên herdu rêjêman.

Gerek hezên pêşketî di herdu la de hevdu bigirin û ji alê din ve alikarî ya hêzên gel bikin. Ew serûberê dijwarê ku tevgera kurdî evro tûşbûye, hevkariya wê bi tevgera komunist re pitir pêwîst di be. Ku nabe ew tekeliya stîratîjîk bi ya taktîkî biguhre.

Tevgera gelê Kurd di nav welatên kevneperest û burjiwaza welat de nikare dostê xwe hebe. Gerek ew destê xwe ji revenda burjiwaz bikşe, li hemberî kirina Emperyalist û hergirtinê bi tevgera Komunist re bide ber xwe û ji bo wê êkatiyê ji rêkxirawa me hemo pêşniyaran dixte ber parta demokrat. ✶

# Huner û Derdê Milet

Dema di nav dilê mirovî de agirê kovana berdibît, hinavêt mirovî diqirqiçin bi derdê wan kovan û êşan. Hingê her kesek bi şêwekî wê dilsotina xwe diyar dike. Hind bi rondi hestiran agirê dilê xwe sar dikin. Hind ji wan kovanan saz û awaz û stiranan dijenin û bi wan awazan aronka xwe tena diken, ku dema mirov guhdariya wan awaz û stiranan diket, ji nû agir li dilê mirovî jî hel dibe û bi wê çendê mirov dikare derdê wê stiran bêjî bizane, ku dinav me kurdan de ew tixm zorin û bê hijmarin. Ger em bixwazin behsa wan bikin, gerek em pirtûkan li ser binvisin û hên temam nabe, evca di gotarek ho kurt û di rojnamekê de ew delive wê çawa peyde bibe?!

Hinek din hene ji wan derd û kovanan çîrokan dirêsin û hinek din helbestan divehînin û kezeba dilê mirovî di bizivît. Em bi helsbet û vehandinên "Ehmedê Xanî" dikarin bizanin kovana evîna di dilê "Mem û Zînê" de çend mezin bû! Bi helbestên "Welî Dêwane" em dizanin wî "Şem" bi evînê diperist û "Feqê Teyran" bi vehandina xwe derdê "Şêxê Senian"nişan me dike.

Gelek din ji hene ji derd, kul û kovanê dilê xwe re ne distirin û ne jî çîrok û helbestan dirêsin. Ew bi nexş, nîgar û xîşkêşanê derdê dilê xwe dibên.

Helbet ew kes hemî hunermendin û ew karê ewdiken huner e. Erê gelo, dinava gelekê bê wilat û perçekirî û di bin hezar rengên zordariyê ve, wê çend û hunermendên çawan jê peyde bibe?

Ez bawerim di nav giyanê her kurdekî de hunermendek heye, lê jêhatin û pêvehatina hineka ji hinekan pitir e.

Lê huner kîjan û çawan?

Di kawdanekî wek yê gelê Kurd de gerek her tişt û her kar û her huner di wee û xizmeta gel û milet de be û derdê milet bêje, ne ku bitenê di ber deriyê xwediyê xwe de bileyze. Gotin li ser vê çendê ji wê dirêj bibe û ev ne deliva wê ye.

Hunermend "Rêving" sala 1962-an çavên xwe ji jînê re vekirin û bû karwaniyê rêya jînê. Di zaroniya xwe de ew ji zaroyên kurd dûr bû û bi hinek zaroyan re di leyzî û di çû xandingehê ku zimanê dayîka wî ne zanibû ew ji çiya, rûbar û çemên Kurdistanê dûr bû. wî ji biçûkaniya xwe dostanî bi huner re hebû, musîk û wênekêşanê.

Ew mezin bû hezkirina wî bû huner mezintir bû. Hemî xweziya "Rêvig" ew bû ku ew di dibistanek hunerî de xwendina xwe temam bike. Lê bi milyonan zaroyên Kurdan ji xandingehan bê bahrin çunkî kurdin. Lewra "Rêving" jî ji xweziya xwe bê bahir bû çunkî Kurd bû û ne di gel partiya Baas a Erebî bû. Lê dijmin nikaribûn wê hezkirina wî bo hunerî di dilî de bikujin. "Rêving" mezin bû û pitir derdê Kurdistana wî ew hişyar kir. Wî ji evîna xwe bû welat derdê welatê xwe bi çend nîgaran nişa dan îro jî ew ji derdê Kurdistanê her nîgaran di nexşîne û her tavleka wî hezar derdên milet dibêje.



Ev jî nimonên tavlên hunermend "Rêving" ın ku di nişandanekî de li Kurdistanê di sala bûrî de berçav kirî bûn:

Em bawerin ku hunerê her hunermendek Kurd zimanê derdê milet be.

## Firrî

S. Avdel

Demê fala
Ewan çavan min vexwandî
Zengila rastiyekê lê da
Bo viyanê tu ya mandî
Wek bi lota
Li dûr hêlînê dizivrî
Tu kutra evîna min bûy
Te germatiya dilî sar kir!
Wî demê tediyar kirî
Toqe kirin bidestê çepê..
..zerer kirine
Bo demekî
Xwe ji birkirine
Zû xweya bû..
Tirazîka tu pê dikêşî
Diz û lenge.
Ew kirasê te idenê day
Yê bê renge!
Ew Huşkûka di destê te de
Gelek kevne û
Menceloka mala babê ji
...pirî jenge
Kezî wesa ya hû kirî
Kur tu her xwe bi zaro bizanî
Zarokeka hizir bestî
Ji nû radibî westîka
Ne şêy xwe li ser piya bigirî
Ne, newêrî
Desta ji darê landkê berdey
...xwe azad key!
Te bawerî bi piya nine
Rastî yeke ji te re dibêjim
Xwe rast bigorînî pêtûye
Mirov bivînê
Lê te bawerî bi vejena xwe ne anî
Bo gorîne..
Gorîn bo berziya jînê
Dê mêzeke...
Vê satora te weşandî
Birîna kûr..
Viskêt xwînê
Te xwe li vê hêskê dada ba
Dabî cihê pêxurînê
Her dema te gotiba "Memo"
Da bêjime te: Belê "zînê"
Lê çi bikim!?
Ew evîna bo hetayê
Minli di zindan kirî
Te der lê şikand
Bi ne çarî ve
Li perêt xwe da
Hindî min dîtî
Firrî...
Firrî
Hingê esmanê gundê me
Sing vequta
Ewran bo melûlya vînê
Berda girî
Kire girî

1984

Ji R. 2

### Xumênî ji Sîbera xwe ditirse

2- Xaniyê duwem 10 jorin, yek ji kurê wî Ehmed Xumênî reye.

3- Xaniyê Sisiyan yê Ehmed Xumênîye û hinek caran birayê jina Ehmed (Tebatebayî) bi jina xere tê de dijî.

4- Xaniyê çiwarê (Husêniya Cameranê) ku Xumênî têdê çav pêketina xelkî dike.

Ji bilî Ehmedê kurê Xumênî, kesên din yên bine malê ji dervey cemeranê diminin. Birayê wî yê mezin Mehemed Riza têkiliya xwe pêre nehêlaye, piştî girtina kurê wî.

Eveye halê Xumênî û eveya jîn û xwe parastina her diktatorekî

Ev gotara ji rojnamên biyaniya hatine wergerandin

XWEDI:
Dr. Cemşid Heyderî
BERPIRSYAR& REDAKTOR:
Kerîm Hussamî
TRYCK: ARARAT TRYCK

# Serdema Nû

*Rojnameke siyasî, çandî û civakî ye*

P.O.BOX 7066
16407 KISTA
SWEDEN
Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412

Sal 2 Hejmar 24 çile - January 1988 Biha 10 skr.

## Siyaseta du rûyî ya Îranê

Piştî roxana hukmeta şahî li îranê, netewên ne faris (Kurd, Ereb, Tirk û Bilocan) daxwaziya mafên xwe kirin ku ew jî otonomî (xwe mixtarî) di nav çarcûva dewleta îranê de. Lê serkêşên oletî yên îranê ev mafe bi xwe cudakirinê navkir û bikarek dijî şoreşê da niyasin. Her çend melayên îranê bi dev dibêjin ku xelkê Îranê hemî azad û serbestin, lê ew bi kiryar û karên xwe li dijî azadiyê ne û hîç guhdariya mafên wan gelan naken.

Ew bernamên ku di wextê xwe de danabûn ji bo çareserkirina pirsên wan netewan, heya îro di cî de mane tiştek ji wan bi cî na anîne. Her di sala 1980-an de gotin ji bo çarekirina pirsa kurdî hatinkirin. Lê çi bi wan gotinan ve nehat û ew bû di navbera pasdarên îrnê û leşkerê îranê ji alekî ve partiya demokrata Kurdistana îranê û pêşmergan ji alê din ve şer helbû. Ew bû partiya demokratî ya Kurdistan li Îranê û digel çend partiyên din hatin qedexekirin. Xumênî Sadiqê Xilxalî şande Kurdistanê. Ku heta zaroyê 15 salî jî bi kuştinê mehkom di kirin. Her ji wê demê de top û Firokên îranê gund û bajarên kurda bumbekaran dikin. Kurdan bi xortî ji warê wan bar dikin û li ciyên din dinav îranê de xwe cî dikin. Her wiha ew bixortî genc û lawên kurdan digirin û bo berokên şerê di gel iraqê de dişînin. Karbidestên Îranê dixwazin aloziya bêxin navbera şîe û sinniya de. Ew cudahiyê bi kurdan re peyde dikin û siyasata kuştin û ji navbirinê di gel wan bi kartînin. Desthilatên îranê bi serkêşiya Xumênî dixwazin li gor mezhebê şîe çaresera pirsa netewên din bikin, bi wê hiviyê ku ew dixwazin miletê îranê hemî yek be. Sevkêşî ya şîe li îranê digel gelên din yên ne şîe de cudahî dike. Li roja 8-12-86 televizyona Emrîkî (C.B.I) xweya kir ku komela rêkxirawa netewên hevbûyî diyar dike ku serkêşa îranî heta kesên efganî jî bi dereca du da dine.

R.3

## Xumênî ji sîbera xwe ditirse



Piraniya çavdêrên siyasi yên deverê û welatên Ewrupa, di wê bawerê dene, ku her guhrînek li Îranê peyde be, bi Xumênî ve girêdayî ye.

Di Îranê de her ewe xwediyê biryarê, her du kempên mezin, her yek û li gor daxwaz û berjewenda xwe dixwaze guhrîn peyda be. Hinek la rast û rast pir bikarin ji bo guhrînek bineretî, ku ne her Îran ji wê rijêma paşkî rizgar biket, lê wesa ji pêngavan pavêje ji bo pêşve çûn û careserkirina aloziyan û dawî anîn bi şerê Îran, Iraqê. Alê din dixwaze ji Xumênî rizgar bibe, lê dar û destên wî her bimîne. Ku di serdema Şah de çawan bû, her wilo bimîne. Çunkî ew rijêm pitir ji Şahî wê xizmeta berjewenda wan bike. **Saxlemiya Xumênî û parastina wî çawan e?**

Li gor destgehên rojava wisan diyare ku jîn û saxlemiya Xumênî xirab dibe. Ew tûşî nesaxiya ji bîrkirin û xelk ne nasînê bûye, ku kesên li dûr xwe ji na nase.

R.2

## Kurd û Kurdistan

Pişka 2

**M. S. Lazerev**

### Egerên siyasi yên hundirî

Kurdistan li gor têkiliyên civakî û aloziyên netewî, di kevte di herêmekê de ku, herdem di siyasetê de gêjbangê dike (dizivre). Ew jî ji ber van sedeman:

1- Wilatê Kurdistan di gora madî de pilek nizim heye. Li gor serjimêra sala 1970-an, her ji bo 10 hezar kesan bi tenê yek dixtor hebû. Lê bi giştî li Tirkiyê her ji 10 hezar kesan re 4 dixtor hebûn. Di Kurdistana Îranê de di sala 1966-an de, her ji 4800 kesan yek dixtor hebû. Hinek cî hebûn ku hejmara xelkê wan 20 hezar kes dibûn. Lê yek dixtorê wan tune bû. Dîsa her di wê salî de 50% xelkî bi tinê yek jor hebû, û 80% ji xaniyên wan ji heriyê çêkirîbûn. Ew jî bû egera hindê ku aloziyên civakî zor bin.

2- Sîmayê wê bizavê û berxwedanê ne her civakî û siyasiye, her çend ew li ser binyata civakî ye, lê di guhre berev netewî.

3- Di pêşde û nihe Kurdistan meydana bizava netewî ye û armanca serkî jê berjewenda millet û rizgarbûna netewî ye. Lewra sîmayê wan kesên li dervey wê tevgerê, (Yan yên ku dijatiya wê diken), ew tuxmin di civata kurdawarî de, ku bi sedema cudahiyê ew xwe dixin digel netewa desthilat yan yên rojava.

Caran bi kurdan re Ermeniyan jî ji bona doza xwe dixebitîn. Lê îro di Kurdistana Tirkiyê û Soriyê de her tevgera Kurdî ye di bazinê xwe da. Di Kurdistana Îranê de, ew bi Azeriyan û Kêmatiyên netewî yên din re cîrane, mina ereban bi taybetî di Kurdistana Îraqê de di gel Asorî û Nestoriyan de. Bi vê yekî tevgera netewî ya Kurdî barek siyasî yê navxweyî di serdemek nû de pêk tîne. Helbet nemana wê ewe ku xebata çînatî ne ciddî ye. Lê berûvajî, niha serhildana çînatî dijwartir bûye. Têgihiştina çînatî geş bûye di tevgera Kurdî de, ew heta niha xismeta berjewenda xebata netewî dike ji bona bicî anîna Karê netewî.

4- Serûberê siyasî di nava wan welatên ku axa Kurdistanê pêve girêdayî, dibin barê aloziyên siyasî û civakî de maye.

Di salên 1960-80-an li Îraqê û 1949-70-an de li Soriyê çend car Înqilab bûne. Di Îranê de di salên 1945-53-an de barê siyasi ne tena (rehet) bû. Di gor pirsa Kurdî jî de ew bûyer pêre hev digirin û rûmeta rast ya Kurdna nişa dikin.

Nikarî û nexwaztina wan karbidestan ji bona careser kirina mesela Kurdî û tev netewî, bûye egera peqîna barê siyasî di wan welatan de. (ji bilî Sorya). Dîsa her guhrînek tê de bûye egera alozbûna mesela kurdî jî.

Paşî niviskar behsa wan guhrînan dike yên ku piştî beyana 11-Adara 1970-an de li Îraqê rûdan.

Niviskar tibla xwe ji wê re dirêj dike ku serûberên jêriya rojava ya Asiya kaûdanên wisa peyde na kin ku di demek nîzik de çarekê li pirsa Kurdî bikin. Bêgoman hatina her rijêmekê di wan welatan de bê cudahî nîne li gor pirsa kurdî. Yan ku her guhrînek di rijêmên wan welatan de kar li serpirsa Kurdî dikin. Ev ca ger ew guhrîn ji bo demokrasî bin, hîngê pirsa Kurdî ji dê geş bibe. Lê ger wiha ne be, dê bibe egera kêmbûn û nizimbûna wê. Mîna Înqilaba 1960-an li Tirkî, rêxweşkir ji bo serhildana Kurdan. Paşî niviskar behsa wê dike ku, di 25 salên dawî de tevgera Kurdî ji alê siyasî, rêkxistin û idolojîk ve baştir pêşde çûye.

Her wiha ew behsa şorişa temmuza 1958-an li Iraqê dike û dana mafê otonimî ji bo Kurdan, ku ew ji berhemê xebata çekdarî û têkoşanî bû bi serkêşiya Mistefa Barzanî.

Di Soryê de pirsa kurdî heta dawiya salên pênci, rolek diyar nebû, lê saya serê şorişa Kurdistana Iraqê, ew ji çê bû.

Di Kurdistana Îranê jî de, piştî şorişa Mehabadê, demê 20 salan gelê Kurd di bin sitema şahî de ma û ew nikaribû serê xwe hilde. Lê piştî şorişa Îslamî bûyerên mezin peyde bûn ku sê tiştan ji me re nişa dikin:-

1- Vemiryana tevgera netewî ya Kurdên Îranê, ne temam (Mutleq) bû, lê dema wê bû.

2- Ew rîforma bi (şorişa Sipî) nav kirî, direng gehişte deverê û nikarî bû pirsa netewî çare bike. Dawiya vê gotarê dê di jimarên bên de belav bibe.

Dumayî ev gotare di hejmar 25 ê dêta bilav kirin.